# *Çarmalika Elî Herîrî*

**(Ji berhevoka Sosin û Prym- 1889)**

Amadekirin: Cankurd

Ger hûn bibînin nalê eşq
Tênû li bom zarî diken
Herkes bizanid h'alê eşq
Bexîlî dijwarî diken

Bexîlî eşq bexîl bibûm
Herdem bi dem zelîl dibûm
Bê rah û bê delîl dibûm
Herkes bi xemxwarî diken

Hûn bar mekin gel min di zor
Li hesreta werdên di sor
Çavê di reş bisk têne dor
Enya bi nûr tarî diken

Enya bi nûr zulf têne ser
Rengîn dibin şems û qemer
Reşmar ji perda anîne der
Li e're'ra yarî diken

Xweş e're'ra şemsa di qed
Teşmîn rewa sebr û xîred
Ah û meded, ah û meded
Çeşmen çû gumarî diken

Çavê li rojê bîne kom
Cama meyê anî ji bom
Emro kir lazim vexum
Mestî li min carî diken

Mest û şerab qandivê
Esîr û bendêt vê şevê
Ger wesfêt yarê ez bibêm
Hûn terkî hişyarî diken